Dumahîk : Bîranîna Y. Guny

sûcdar dikin û 18 sal ceza didinê. Y. G di zîndanê de, sîneryoyê Sê filman **"Kerî**, **Rê û Em Sibe Sûşeya pacê û du nan dixwazin** " dinivîse .

Y. G ji ber pirtûka a qedexekirî, ya bi navê " **Li sr faşîzmê** " bi 7 sal û nîvan zindan û du sal û nîvan jî surgunî tê cezakirin. Û ji ber nameya wî ya ji Sênor Fernando Herera, berpirsiyarê Fastîvala Valadolid (Espaniya) rêkiriye re, dadgeha Tirk wî bi Pênc salan ceza dike .

Piştî teqlekirina leşkerî ya 12 Êlûna 1980 î, Y. Gûney ji welêt direve û berê xwe dide Firansa . Û di Ber Çilê 1981 an de, destlata leşkerî wî ji hemwelatiya Tirkiyê bêpar dike. Di sal 1982 an de, filmê wî Rê, di fastîvala navneteweyî ya **Cannes**`ê de, xelata zêrîn distîne. Di sala 1982-1983 an de, Romana wî " **Ew Stûxar Mirin** " bi zimanê Firansî dibe filim û derdikeve.

Li Firansa, di 24 ê Sibata 1983 an de, Y. Gûney, bi çend ronakbîr û rewşenbêrên Kurd yên navdar re, ji bo parastin û pêşvebirina çanda Kurdî, Enstûtiya Kurdî dadimezrînin .

Y. Gûney, di 09 ê Êlûna 1984 an de, li dûriyê, li nexwaşxaneyek Parîsê çavên xwe dadimrîne û diçe ser dilovaniya xwe .Berî mirinê, Y.G weseka xwe dike û dibêje ku, ez mirim wînê termê min ji mala min rakin [2] . Di 13ê Êlûnê de, termê wî tînin enstîtuyê daku, berketiyên wî silava dawî lê bikin. Derdora çar kat û nîvan, bi qasî 2000 mirov,bi beşdariya şalyarê çanda Firansî Jack Lang, Sefîrê Yonanstanê, nûnerê partiya komonîst ê Firansa, sekretêrê yekem ê partiya sosyalîst ê Firansa, pir hunermend û lîstevanên sînemeyan , rêxistinên Kurd ji herçar perçan, bilî bi sedan name û tilgiraf ji berketiyên wî gihane enstîtuya Parîsê. Di ber termê wî re derbas dibin, silava dawî lê dikin û serê xanima wî Fatiş û keça wî sax dikin. Di dû re, Y. Gûney, di goristan mêrxwsên Komona Parîsê de vedişêrin.

Helbestvanê gewre, Cegerxwîn, ji enstîtuya Kurdî li Parîsê re vê namê dişîne:

(Mirina dostê min ê hêja Y . Gûney dilê min perçe kir. Ez pir xemgîn im, dil bi dul im.

Yelmez stêrkeke geş bû di esmanê miletê Kurd de. Pir zû xuricî. Bi mirina wî dîwarek mezin ê seqafeta Kurdî hiweşiya.

Feleka bêbext dest neda ku ew merema xwe bibe serî. Filmên nû çêkir, doza Kurdistanê bi cîhanê bide nasîn . Em çi bikin?. Hêvîdar im ko ewê, stêrkên din di esmanê me yê reş û tarî de peyda bibin. Û dewsa wî bigirin.

Mirin li pêşiya me hemiya ye, jêre çare nîne. Tu kes nikare xwe jê xelas bike. Lê gava ew wilo bêbext bi carek tê, hê xedartir e.)

* -Cavkanî:

***- Kovara Hêvî . Hejmar 3**

*** - Kovara Sînemegriyê ya Sûsriyê . Hejmar 23-24. Buhar- Zivistan. 1984-1985**

1- Wergêrê nama Y. G. ya ji zîndanê, ji xanima xwe re dişîne . Fadil Çetker, dibêje: Navê bavê Y.G. Hemîd e .

2-Mala wî : Enstîtuya Kurdî Li Parîsê